Kurmanji

# SIYASETA PARTIYA ÇEP

PÅ DIN SIDA

Gelo bi dîtina te jî gereke her kesê li Swêdê heqê kirîna xwarinê û dayina kirê pê re hebe?

Bi dîtina te ciwan, li ku mezin dibin bila bibin, divê kar û xanî peyda bikin da karibin jiyana xwe ava bikin? Bi dîtina te divê nexweşxane ji bo nexweşan bin, ne ji bo qezenca şîrketên lênerînê bin?

Wê demê tu û Partiya Çep li yek alî ne.

Yên li aliyê din ew in ên ku îro Swêdê birêve dibin: Hikûmeta rastgir û Demokratên Swêdê ne.

Wan ji bo yên herî dewlemend bac daxistine, lê di heman demê de hejmara zarokên di feqîriyê de mezin dibin zêde dibe. Wan dermanên nexweşan bihatir kirine û nexweşxane neçar kirine ku ji xwe kêmtir bikin. Ew zorê didine mirovên ku dixwazin kar bikin, pêşeroja xwe li Swêdê ava bikin da ji vî welatî derkevin.

Gelo tu jî ji vê siyaseta ku zengînan zengîntir dike û mirovên ji rêzê li dijî hev radike aciz î?

Gelo tu jî hesreta siyasetekê dikişînî ya ji her kesê ku ji bo jiyana xwe ya rojane li ber xwe dide? Her kesê zarokên xwe tînin, kar dikin, paqijiyê dikin, dixwînin û xwarinê çêdikin. Ji bo hemû kesên ku dihêlin çerxa vî welatê xweş bigere. Partiya Çep amade ye bibe beşek ji hikûmetekê ku dixwaze civakeke biewle û dadwer ava bike, bêyî ku ferq bike bê em ji ku tên. Hikûmeteke ku dihêle kiriya xaniyên em di wan de maqûl be, xwarin û elektrîk arzan be, xwendegeh û nexweşxane baştir bin.

Partiya Çep. Em li aliyê te ne.